Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 55
15'ê January
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Cejna 2'ê Rêbendanê Pîroz be

Roja 22.01.2007'an, 61'emîn salvegera avakirina yekemîn Komara Kurdistanê bi destê Pêşewayê nemir **Qazî Mihemed** e. Em di pêşwaziya wê cejna neteweyî de pîrozbahiyên xwe yên herî germ pêşkêşî neteweya Kurd dikin. **Desteya Weşanê ya Agirî**



# Terorîzm Parek Ji Stratejiya Îranê Ye


Nameya Birêz Mistefa Hicrî Bo Birêz "Bon Ki Moon" 2

Cudabûnên Nava Refên PDK Îranê, Sedem Û Encamên Wan 3

Şewat Yê Bûye Aleva Givaşa Rejîmê Bo Ser Xelkê Kurdistanê 5

Pêvajoya Xebata Jinan Di Îranê De 8

Di Edebiyatê De Forma "Ez" 9

SÎNOR 10




Piştî axaftina Buş li ser piştevaniya Îranê ji sebebkarên tund û tûjiyên di Îraqê de, "Can Negroponte" berpirsê saziya Ewlekarî ya Neteweyî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, rejîma Îranê bi vê yekê tawanbar kir ku ji kiryarên terorîstî weke parek ji stratejiya ewlekariya netewî ya xwe mifahê distîne. Wî da zanîn: "Nirxandina me eva ye ku Îran karîn û şiyana xwe di îdarekirina kiryarên terorîstî li derveyî welat, weke faktereke bingehîn di stratejiya ewlekariya netewî ya xwe dihesibîne".

Herweha vê yekê weke alavek bo pêşgîrî ji êrîşên Amerîka û Îsraîlê, jar û lawazkirina Îsraîlê, xurtkirina nifûza xwe ji rêya tirs û xof û hovîtiyê û neçarkirina hêzên Amerîkayê bi derketin ji deverê dihesibîne.

Li doma axaftina xwe de îşare bi Hizbulaha Lubnanê kir ku li warê malî, perwerdehî û leşkerî ve girêdayî bi Îranê ye û got:"Hizbula mêhwera "stratejiya terorîstî ya Îranê pêk tîne".

Wî hişyarî da ku nabe Îran bibe xwediyê çekên pêşketî, çunku gefek mezin bo ser welatên Kendava Fars û berjewendiyên Amerîkayê ye.

## Barzan Tikrîtî Û Ewad Bender Hetin Îdam Kirin



Li gor agahiyên Ajansên nûçeyan vê sibê seet 5'ê hikmê sêdaredan ê li ser zirbirayê Sedam, Barzan Tikrîtî û Ewad Bender de hate cî bi cî kirin.

Her yek ji wan li doza Doceylê de bi Sedam Husên re biryara kuştina 148 hevwelatiyên Şîî dabûn û her bi vê sedemê hatin Îdamkirin.

## Konferansa: "Turkiye li Aştiya xwe digere" li Enqereyê hate lidarxistin




Yaşar Kemal

Dom R: 7

Derhêner Seyfedîn Cebarî:

## "Rêveçûna Festîvala Navneteweyî ya Kurtefîlman Li Kurdistanê, Gaveke Girîng Û Dîrokî Ji Bo Sînemaya Kurdî Bû"


Hevpeyvîn di R: 11



www.arsivakurd.org



# Nameya Birêz Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Bo Birêz "Ban Ki Moon", Sekreterê Giştî Yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî



Birêz "Ban Ki Moon"!
Sekreterê Giştî yê Rêxisitna Neteweyên Yekbûyî!

Pîrozbahiya hilbijatin û destbikarbûna cenabê te weke Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, dikim û hêviya serkevtina te li bi cihanîna vî erkê girîng de dixwazim. Erxayîn im cenabê te hest bi qursbûn û girîngiya bi stûgirtina vî erk û berpirsayetiya girîng û hesas kiriye û haydar in ku di dema destbikarbûna we de, li cihên cur bi cur ên cîhanê de weke Afrîqa, Asiya û nemaze li Rojhilta Navîn, tevî çi cure pirsgirêk, alozî û neewlehiyan ber bi rû ne. Birçîbûn, newekhevî û hin berçaviyên civakî yên din mefer ji xelkê birandine. Desthilata zordarane ya hikûmetên dîktator, paremayî û ne îroyîn, jiyan, maf û azadiyên bi sedan milyon mirovan kirine goriyê îdeolojî û totalîterxweziyên xwe, pêtir ji wê yekê jî ewlehî û aramiya zaf cihan xistine tirs û xeterê ku yek ji berçavtirînê wan rejîmane, rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye.

Keyfxweş bûm ji ber ku yek ji armancên we ji bo rûbirûbûn tevî pirsgirêkan, sertazekirina bawriya civaka navneteweyî bo NY'ê ye. Gumana min di wê yekê de tune ye ku cenabê te haydar e ku NY,ê demekê dikare hitbar û baweriya civaka navneteweyî bigerîne cem xwe ku di peydakirina rê û çareya pirsgirêkan de adilane riftarê bike û ji bo parastina mafê mirovan di her kunceke wê cîhanê de çalaktir bigere. Di welatê me Îrana bin desthilata Komara Îslamî de, maf û azadiyên pêtir ji 70 milyon kesan bi awayeke herî dijwar tê binpêkirin û xortên ser bi neteweyên din ên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd li mafê netewayetiya xwe hatine bêparkirin û di vê rastê de kêm sal hebûne ku Komara Îslamî ya Îranê ji aliyê Komîsyona Mafê Mirovan ya NY'ê ve, nehê mehkûmkirin. Bi eşkere fitnê û arîşê di welatên herêmê de çêdike, maytêkirinên di kar û barên welatên Libnan, Efxanistan, Îraq û ... de ji kesê re veşartî ninin.

Dijberiya hemû tevger û pêvajoyên aştiyê û yek ji wan aştiya di navbera Îsraîl û Felestînê de, dike. Li astên bilindtir de jî him bi hegera cehdkirinê ji bo bidestveanîna çekên Etomî û him jî bi pêkanîn û bihêzkirina taqim û destekên terorîstî û berfirehkirina terorîzmê yê bûye xetereke berçav bo civaka navneteweyî û di vê derheqê de tevî her yek ji wan pirsgirêkan, ne tenê kêmtirîn hemyet û girîngiyê nade mehkûmkirinan û biryarên NY'ê, konseya Ewlekariyê û Komîsyona Mafê Mirovan yên vê rêxistinê, belku bi qumar û laqirdî digire û her ev yeka jî baweriya xelkê û azadîxwazan derheq NY'ê, dibe bin pirsiyarê. Ya ku dikare vê hitbar û baweriyê vegerîne bo vê rêxistina navneteweyî, rû bi rû bûna micid û bibandor e tevî vê rejîmê û rejîmên weke wê.

Bi giştî xelkê Îranê û nemaze xelkê Kurdistana Îranê bi hêviyekê ve mêzeyî hewlên cenabê te di pêxema bibandortir bûna NY'ê û vegerandina hitbarê bi vê rêxistinê ye. Partiya me jî, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê amadeyî hemû cure hevkariyekê ye tevî NY'ê di çarçoveya her cehdekê de ku mafê mirovan dabîn bike, aştiyê li pey xwe bîne û terorîzmê binbir bike.

**Tevî hêviya serkevtina dubare bo cenabê te**
**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**13.10.1385**
**03.01.2007**

## Seredana Şandeke Bilind A Sê Partiyên Kurdistana Turkiyê Li Deftera Siyasî Ya PDK Îranê

Şandeke bilind û hevbeş a Partiya Sosyalîst a Kurdistanê(PSK), Partiya Demokrat a Kurdistana Bakûr(PDK Bakûr) û Partiya Welatparêzên Demokrat a Kurdistanê(PWD – K)'ê ku pêkhatibû ji birêz Mesûd Tek, Sekreterê Giştî û Nûredîn Agirî endamê rêberiya PSK'ê, birêz Rojhat Amedî, Sekreterê Giştî û Nêçîr Cizîrî, endamê rêberiya PDK Bakûrê, birêz Botan Taş, Sekreterê Giştî û Ekrem Dêrsîmî, endamê rêveberiya PWD – K'ê, roja çarşem, 20.10.1385(10.12.2007)'an, seredana Deftera Siyasî ya PDK Îranê kir û ji aliyê birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Gitşî, Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî, Mihemednezîf Qadirî, endamê Deftera Siyasî û birêz Çeko Rehîmî, Husên Nazdar û Eseed Ehmedî, endamên Komîteya Navendî ya PDK Îranê ve, bi germî hatin pêşwazîkirin.

Di civîneke dostane de partiyên mêvan merema xwe ji seredana han, nûkirina pêwendiyên siyasî, neteweyî û niştîmaniyên xwe tevî PDK Îranê dane zanîn û PDK Îranê xwediyê dîrok, erk û wezîfeyeke welatparêzî hesibandin. Her wiha îşare bi vê çendê jî kirin ku rêberiya hilbijartî ya kongireya 13'hemîn a PDK Îranê di hizra me de parêzerê bihayên siyasî û neteweyî yên gelê Kurd e û li dirêjahiya dîroka xebata siyasî û neteweyî ya xwe de PDK Îranê nîşan daye ku helwest û siyasetên wê li xizmet armancên gelê Kurd de bûne.

Piştre bal kişandin ser rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn û basek li ser pirsa Kurd û bandora guhertinên herêmê li ser bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd bi giştî, hate kirin.

Rapora Bêykêr – Hamîlton li ser rewşa Îraqê û hegerên bi bandor ên vê raporê li ser pirsa Kurd, di nava beşdarên civînê de kete ber guhertina bîr û rayan û helwesta serkirdayetiya siyasî ya Kurdan di vê derheqê de bilind hate nirxandin. Her wiha îşare bi vê yekê hate kirin ku divêt rewşa siyasî û neteweyî ya gelê Kurd nemaze li Herêma Kurdistanê de bi hûrî û lêzanîneke zêdetir li pêvajoya bûyeran de were berçav girtin û cihgîrbûna desthilata siyasî ya Kurd û dabînkirina mafên berheq yên gelê Kurd, hewcehî bi siyaset û dîplomasiyeke çalaktir heye û her wiha hevkariya hêzên siyasî ên Kurd jî di vê derheqê de weke erkeke niştîmanî û neteweyî hate nirxandin û tekez li ser hate kirin.

Li dawiya hevdîtinê de şanda mêvan car din li ser pêwendiyên dostane û berfirehtirbûna pêwendiyan di navbera her du aliyan de tekez kir û şanda PDK Îranê jî sipas û pêzanîna xwe li hember şanda mêvan da kifşê û helwesta siyasî û welatparêziya wan derheq PDK Îranê helwesteke dîrokî, neteweyî û welatparêzane hesiband.

# Cudabûnên Nava Refên PDK Îranê, Sedem Û Encamên Wan



**Têmûr Mistefayî**
**Beşa 1**

Piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê û valabûna ort û meydana xebat û tekoşîna siyasî di Îran û Kurdistanê de, PDK Îranê di bin rênîşandayîna Komîteya Navendî û fikr û ramana hûr, jîr û zîrekane ya rêberê navdar yê gelê me, şehîdê nemir Dr. Ebdulrehman Qasimlo di 11.12.1358'an ya Rojî (03.03.1980) tekşîna xwe ya aşkera îlan kir. Di vê qonaxa xebatê de, rêberiya partiyê ji bîr û ramanên "Tûde" (Komonîst), eşîrî, demokrat û netewexwaz pêk hatibû û ev raman bi hev re têkel bibûn. Nûner û serkêşê hizr û ramanên Komonîstî (Tûdeyî) di rêberiyê de Xenî Bilûriyan û Mihemedemîn Seracî bûn, nûner û serkêşê ramana netewexwazî û demokrat Dr. Qasimlo bû û çend kes jî nûnerên ramana eşîretiyê bûn.

Ev bîr û ramanane di salên derbiderî û xerîbiyê de, bi sedema dûrbûn ji welat û nebûna têkiliyên wan yên rasterast bi xelkê re, bi her awayekê be li hev hatibûn û dengvedana hizr û ramanên wan di çarçoveya wan kasan de bû ku li mişextîbûn û xerîbiyê dijiyan, lê bi sedema dereng vegeriyana wan ew jî bêwext û dereng ji bo Kurdistana Îranê û çêkirina peywendiyan tevî civatên bicoş yê xelkê û nemaze ciwanên xwendekar di hundirê welat de, di wê demê de gelek partiyan di nava gel de ji xwe re tagirî kiribûn û bala gel bo aliyê xwe rakişandibûn. Lê dîsan ji ber hitbarekê ku PDK Îranê li Komara Kurdistanê û bizava çekdarî ya salên 1346 - 1347 (1977 – 1978)'an jêre bicî mabû, di bin fikr û ramana hûr û zîrek ya Dr. Qasimlo karî xelkek zaf li dora xwe kom bike. Di vê çax û dewranê de her yek ji wan sê ramanane ku me qala wan kir, hawilandine alîgirên herî zêde li dora xwe kom bikin, heta belkî bikarin di kongireya 4'em de ku di pêş de bû, rêberiya PDK Îranê bidestve bigirin û partiyê ber bi wê rêbaz û aqarê bibin ku tevî bîr û ramana wan hev digre.

Di vê pirsgirêkê de Partiya "Tûde" (Komonîst ya Îranê) û Komara Îslamî betal nerûniştibûn û bi hemû hêz û qaweta xwe a madî û menewî pişta fikr û ramana Komonîstî ya nava PDK Îranê girtibûn, ji bo vê nifûza ku "Tûde"yiyan li dirêjiya dîroka partiyê de cehd kirine di nava vê partiyê bi dest bixin û bi şandina endamên xwe bo nava Partiya Demokrat û piropagendekirina awayên bîr û ramana "Tûde"yî hewl û bizava xwe ya herî xurt dan.

Ev rêzbendiya ji berî Kongireya Çarem ve heta nava hola Kongireya Çarem bi awayekî sîstematîk berdewam bû. Kongireya Çarem bi vê hevdudanî û pêkhateya ku me bas jê kir, tevî hejmarek nûnerên nû hatî ku heya wan ji rewş û pêvajoyên hundirîn yên PDK Îranê nebûn, hat lidarxistin. Encama Kongireya Çarem herçiqas ne dilxwaz bû, lê her ev hinde ku kesên weke Kerîm Hisamî û Mihemedemîn Seracî deng neanîn, bi xwe curek ji serkevtinê ji bo aliyê demokrat û netewexwaz dihat hesibandin. "Tûde"yiyan ku serkevtina dilxwaz ya xwe di kongirê de bi dest nexistibû, heta bikarin li gorî dilê xwe, Xenî Bilûriyan bikin Sekreter û xwe jî di Deftera Siyasî û Komîteya Navendî de bibin piranî, vê carê bizav dikirin bi her awayekê bibe cihpêyeke xurt û qahîm di nava endamên partiyê de ku piranî ciwan û kêmezmûn bûn, ji xwe re vekin ku di vê çendê de heta radeyekê pêş ketin û Xenî Bilûriyan jî weke endamê Polîtbîroyê hate hilbijartin.

Yek ji xalên pejirandî yên kongireya çarem, domandina gotûbêjan tevî Komara Îslamî bû, her çend pesendkirina vê biryarê jî nekarî berlêgirtinê ji siyaseta şerxwaziya Komara Îslamî bike. Piştî çend mehan ji bi nav gotûbêjan, rejîmê merem û niyeta qirêj û gemar ya xwe nîşan da û her di nava rojên birêveçûna Kongreya Çarem de bû ku êrîşa xwe li bajarên Pawe û Kamyaranê ve ji bo herêmên azadkirî dest pê kir û li pey bi dawî hatina Kongreya Çarem jî, partiyê xebateke zaf kir heta gotûbêj berdewam bibin, belkî pirsgirêka Kurd ji rêya diyalog û gotûbêjan ve were çareserkirin. Hetanî piştî gelaleya 26 madeyî ya şanda nûneriya gelê Kurd ku negihîştu encamekê. PDK Îranê di hewldaneke din de ji bo ku gotûbêj rastî encamekê werin, gelaleyeke 6 madeyî pêşkêşî dewletê kir ku ew jî bêbersiv ma.

Girûpa "Tûde"yî ya nava PDK Îranê bi handana Partiya "Tûde" gişt hewla xwe didan, ji ber ku bi her awayekê be, tevî Komara Îslamî li hev bihên û delîl û belge dianîn ku ji ber vê çendê rejîma Komara Îslamî rejîmeke dijî Împeryalîstî ye û divêt em digel de li hev bikin û bi "xwedgerdanî"yê ku dirûşma wê demê ya Partiya "Tûde"ê bû, razî bibin û çekên xwe danên, lê ji vî alî ve rêberiya partiyê tevî hestkirin bi berpirsiyariyê amade bû gotûbêjan ji bo bidestveanîna Otonomiyê bidomîne. Her di wê demê de jî xuya dikir, heta rejîma Komara Îslamî mafê Otonomiyê ewle neke, partî hazir nabe çekê danê. Ev arîşe hetanî bervar 25.03.1359 (15.06.1980) dom kir ku Taqima 7 kesî: **Xenî Bilûriyan**, **Rehîm Seyfê Qazî**, **Fewziye Qazî**, **Nevîd Muînî**, **Farûq Keyxusrewî**, **Ehmed Ezîzî** û **Mam Hêmin** (hewceyî gotinê ye ku piştre bi biryara partiyê navê Mam Hêmin di vê lîsteyê de hate avêtin û heya ji wê demê şûn de ji helbest û nivîsarên wî di radyo û çapemeniyên partiyê de mifah jê tê standin) di daxuyaniyekê de îlan kirin ku bi pêrewî ji rêbaza diyarîkirî ya Kongra Çarem dê biçin hembêza rejîmê û bi gotina xwe, wan banda Qasimlo der xistiye. Di vê daxuyaniyê de gelek tomet û buxtan ji rêberiyê û bi taybetî şexsê Dr. Qasimlo hatibûn dayîn. Wan di daxuyaniya xwe de PDK Îranê bi "ladan" (derketin) ji rêbaza Kongreya Çarem û xwe bi pêyrewên Kongreya Çarem hesibandinbûn. Eva di demekê de bû ku bernameya partiyê di Kongireyê de hatibû pejirandin ku ew rastî têkçûnê hatibûn. Di vê daxuyaniyê de hatiye: "Komîteya Navendî ya Partiyê di vê demê de bi cehd û hewla birayên wan yên Pasdar pir cinayet encam dane ku wan jî bona vê çendê ji bo civatên xelkê û endamên partiyê di vê derheqê de tu tiştek kifş û eşkere nekirine, xwe bi tawanbar dizanin."

Herwiha di namîlkeya xwe de gotine, li

**Taqima 7 kesî di daxuyaniyekê de îlan kirin ku bi pêrewî ji rêbaza diyarîkirî ya Kongra Çarem dê biçin hembêza rejîmê û bi gotina xwe, wan banda Qasimlo der xistiye. Di vê daxuyaniyê de gelek tomet û buxtan ji rêberiyê û bi taybetî şexsê Dr. Qasimlo hatibûn dayîn**

Kurdistanê du enî hene: Eniya salim û şoreşvan ku dizanin û fêm dikin ku parastina şoreşê li tirsa kompiloyên Împeryalîstî ji hemû tiştekê li pêştir û girîngtir e, eniya din ne salim û dijî şoreşê ye ku destperwerdeyên Oweysî û Palîzban in ku tê nagihîjin û dar û destekê Împeryalîstê ne, her ew edebiyat e ku partiya "Tûde" (Komonîst ya Îranê) bikar dianî.

Di rûpela 8'an ya namîlkeya xwe de anî bûn: "Bi rohnî û bi bêy dudilî divêt em bibêjin ku ev şerê birakujiyê û berhema nesalim ya dijî gelîbûn û dijî şoreşê her du li aliyên eniya dewletê û eniya Kurdistanê ye. Di bûyerên sala borî yên Sine de, xelkê bi çavê xwe kesek dîtine ku li rex çepera şer xwe veşartibû û bi avêtina guleyekê bi padganê, guleyekê ji xelkê re davêje."

Di rûpela 18'an ya vê namîlkeyê de hatiye:

"Divêt têdîtinên partiya Bees ya Îraqê bi yek ji sedemên helwesta girûpên beşdar di doza Kurdistanê li dijî şoreşa Îranê de bibe û ... niha tirsa vê yekê heye ku Kurdistan bi tevahî bibe cihê Bees a Îraqê û kirêgirtiyên Amerîkayê û kompiloyên berfirehtir di vê

www.arsivakurd.org

derbarê de di berhevkiriyê de be."

Bi kurtî wan di daxuyaniya xwe de PDK Îranê girêdayî bi rejîma Bees ya Îraqê bi gotina "Tûde"iyan eyada Împeryalîzmê bi nav dikirin û digotin Dr. Qasimlo heşt milyon Dolar ji NATO'yê ji bo dijberîkirina bi şoreşa Îslamî re wergirtiye.

Balê bidin wan buxtanên neheq ku taqima 7 kesî ji bo xweşxizmetîkirinê bi Komara Îslamî ji PDK Îranê re didan. Ji aliyekê şer tevî Pasdarên dijî şoreşê û dagirker ku bi emr û fermana Îmamê wan yên kevneperest û kerb û kîn li dil, kuştina mirovên Kurd tenê bi sûç û guneha mafxwaziyê wekî cîhada Ekber û xizmetkirin bi Îslamê dizanî û rehm û dilovanî bi mezin û biçûk û jin û zarokên vî gelî nedikir. Van birayên taqima 7 kesî (Pasdaran) tu cinayet û mirovkujiyên hov li Kurdistanê nemeşandin?

Ji aliyekî din ve PDK Îranê wekî alîgirê rejîma Beesê binav dikirin. Piştî hilweşîna hikûmeta Beesê li Îraqê û eşkerebûna dosyayan, çawanî û awayê têkilîkirina Partiya Demokrat bi hikûmeta Beesê re kifş û ron bûn, hate zanîn ku ev partiye di têkiliyên xwe tevî hikûmeta Beesê de serbilind û serfiraz e û ne tenê tu karek nekiriye ku şermê jê bike, belkî her li gorî

**Girûpa "Tûde"yî ya nava PDK Îranê bi handana Partiya "Tûde" gişt hewla xwe didan, ji ber ku bi her awayekê be, tevî Komara Îslamî li hev bihên û delîl û belge dianîn ku ji ber vê çendê rejîma Komara Îslamî rejîmeke dijî Împeryalîstî ye û divêt em digel de li hev bikin û bi "xwedgerdanî"yê ku dirûşma wê demê ya Partiya "Tûde"ê bû, razî bibin û çekên xwe danên**

wan belgeyan derket holê ku PDK Îranê çawa di derbaskirina xebatkarên Kurdên Îraqî ji destê rejîma Beesê de xebitiye û berpirsiyarên Ewlekariya Beesê bi çi awayekê hewil dane berpirsên vê partiyê ji ber rizgarkirina xebatkarên Kurd ên Îraqî di bin zêrevanî û çavdêriya dezgehên ewlekarî û sîxoriya xwe ve bigirin.

Lewra di vê derbarê de rûreşî ji bo Taqima Heft Kesî ma û dimîne ku çawa ev buxtan û tometene ji PDK Îranê didan.

Sedema bingehîn ya cudabûn û veqetiyana Taqima 7 Kesî, di rastî de du tişt bûn, yekem di bin bandora Partiya "Tûde" (Komonîst ya Îranê) û rênîşandayînên wan dixwastin rêberiya Partiya Demokrat bi destve bigirin. Bi vî awayî şûnpêyekê ji bo partiya "Tûde" ya mirî û demborî li Kurdistanê vebikin, partiya "Tûde"eyeke fenabûyî û bednav ku dixwast ji xweştevîbûna PDK Îranê mifaheke xirab û nebaş bistîne.

Sedema duyem bêziravî û newêriya wê taqimê û dar û destekên wan bûn ku şiyan û karîna şoreşkirinê nemabû û dixwastin teslîm bibin û ji bo vê meremê neçar bûn teoriyan ji xwe re bitraşin ku dibêjin rejîma dijî Împeryalîstî ye û di wê qonaxa xebata dijî Împeryalîstî de, divêt her tiştek goriyê vê cure xebat bihê kirin, heta demokrasî û mafên neteweyî jî ku felsefeya hebûna pêkhateya PDK Îranê bûn, di pêxema wê de bihên gorîkirin ku eva jî bi tu awayekê ji aliyê rêberiya partiyê ve nedihat pejirandin. Lewra piştî helwesgirtina Taqima 7 Kesî, şehîdê nemir Dr. Qasimlo li Mehabadê ji xelkê re axivî û ragihand ku taqima 7 kesî dibêjin werin em çekê danên û teslîmê rejîmê bibin, xelkîno hûn çi dibêjin? Em çekê danên an nedanên? Di bersivê de xelkê hawar dikir: "**Em çekê nadanên û dê xebatê bikin**". Piştî vê civînê nasnavê Taqima Îxanetkar ya Heft Kesî li ser wan danîn û ew bi xayîn nasîn û xelkê bi tomarnameyan piştgiriya xwe ji rêberiya PDK Îranê xuya kir.

Piştî wê helwestgirtina Taqima 7 Kesî, hejmarek ji komîte û endam û heta rêxistina ciwanên partiyê tevî girûpa 7 kesî çûne bo nava rejîmê û hindî şiyan û pê çêbûn, xizmet bi Komara Îslamî kirin û sîxor û ajanî li ser xelkê û xebatkarên demokrat kirin. Partiya "Tûde" û Çirîkên "Ekseriyet" (Piranî) jî bi derkirina daxuyaniyan, piştevanî ji Taqima Heft Kesî kirin, lê ji aliyê xelkê ve girûpa 7 kesî ku bêhisab mabûn û nasnavê xayîn li ser wan hatibû dayîn, gelek zû di sê beşan de bûne bilqên ser avê û ji nav çûn, heliyan û dawî bi wan hat. Beşa yekem bûn bi parek ji rejîmê, wekî Farûq Keyxusrewî û ... . Beşa duyem beriya kongireya 7'emîn daxwaz kirin vegerin nava partiyê, Komîteya Navendî ji wan re ragihand ku dikarin vegerin bo nava partiyê, lê berî vê çendê ku vegerin, divêt helwesta xwe li hember çalakiyên xwe ên berê hem li dor siyaseta wê demê ya girûpa 7 kesî ku tevî tevgera neteweyî – demokratîk ya xelkê Kurdistanê dijminahî hebû, rohn û kifş bikin, hem bername û pêrewa hundirîn ya PDK Îranê bi wî awayê ku di kongireya 6'an de hatiye pejirandin, qebûl bikin. Wê demê partî dê çaxekê ji wan re diyarî bike, heke di vê demê de dilsozî û niyaz û merempakiya xwe bi kiryar nîşan dan, wê gavê dê take tak wekî endamên partiyê bihên wergirtin. Ev helweste di du waran de rast û dirust bû, yekem eva ku hesta tolhildanê tê de nebû, duyem PDK Îranê weke partiyeke berpirsiyar û sîngvekirî rêyê li tu hevwelatiyekê bona beşdarîkirin di xebatê de nagire û vê dîtin û nêrîna xwe divê bi awayê nivîskî bidin partiyê ku li gorî vê şert û mercê çend kes ji wan vegeriyan bo nava partiyê. Beşa sêyem jî di daxuyaniyeke fermî de xwe hilweşandî îlan kirin. Piştî vê çandê hejmarek ji wan çûne hembêza partiya dayîk ya xwe "Tûde" (Mihemedemîn Seracî û Xenî Bilûriyan) û Xenî Bilûriyan dest bi cî bû endamê Deftera Siyasî ya Partiya Komonîst ya Îranê (Tûde). Aqibet navek ji wê girûpê nema û niha jî xelkê Kurdistanê weke beşek ji dîrokê lêdinihêrin.

Li vir ji bo dawiya vê beşê ji nivîsarê, ez dê qala gotineke Şehîd Dr. Qasimlo derheq Xenî Bilûriyan bikim: Dr. Qasimlo di sefereke xwe ya Ewropayê de Xenî Bilûriyan dibîne û Xenî Bilûriyan jêre dibêje: "Ez li vir (Partiya Tûde) ji bo ve kar dikim!"


Dr. Qasimloyê nemir di bersiva wî de dibêje: "Ez baweriyê bi te dikim, ji ber ku vê demê ku tu di nava PDK Îranê de bûyî, te bo Partiya "Tûde"ê kar dikir, lewra niha jî ku tu di nav Partiya "Tûde"ê de yî, ji bo me kar û xebatê dikî".

**(*) Endamê Deftera Siyasî ya PDK Îranê**

**Çavkanî:**
**1. Nivîsara taqima 7 kesî**
**2. Gotara Dr. Ebdulrehman Qasimlo**
**3. Rapora Komîteya Navendî ji bo Kongireya Heftem**

**Wergeran ji Soranî bo kurmancî. Azad Kurdî**
**Dûmahî heye...**

## Seredana Hunermendê Bi Nav Û Deng Yê Kurd, Şivan Perwer Ji Deftera Siyasî Ya PDK Îranê



Demjimêr 3' êvariya roja pêncşem, 14.10.1385(04.01.2007)'an, hunermendê mezin yê neteweya Kurd, Şivan Perwer, seredana Deftera Siyasî ya PDK Îranê kir û ji aliyê birêz Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê partiyê û Têmûr Mistefayî, endamê Deftera Siyasî û hejmarek ji endamên Komîteya Navendî ve bi germî pêşwazî jê hate kirin.

Paşan di hevdîtina her du aliyan de, rêz ji çalakiyên hunerî û bi taybet hunera şoreşgerane ya Şivan Perwer hate girtin. Hunermend Şivan Perwer jî di axavtineke kurt de, PDK Îranê bi partiya dayîk û partiyeke nûjen hesiband ku geşekarê wê partiyê rêberê mezin Dr. Qasimlo bûye û ragihand ev partiye di siyasetê de rastbîn bûye û bêguman hetanî bidestveanîna armancên gelê me li Kurdistana Îranê dê her pêşeng û çelengê meydana xebatê bimîne û hêviyên gel dê bidestve bîne.

www.arsivakurdi.org

# Şewat Yê Bûye Aleva Givaşa Rejîmê Bo Ser Xelkê Kurdistanê

**Serbest Urmiye**

Gelo heke di navbera xelkê sivîl de arîşe û pisgirêk derdikevin, di her welatekê ji dewletê weke piştevan û dadwer mêze tê kirin. Îca heke di vê derheqê de di navbera gel û organ yan rêxistineke dewletî de pirsirêg derkevin holê çi dibe? Wê demê ye ku kiryarên dewletê hesta berpirsiyariya wê li hember xelkê de dide kifşê, dide xuyakirin ka gelo ew rejîme çiqas li gor xwestekên xelkê û li ser bingeha dengê gel hatiye avakirin? Di welatên demokratîk de li heman demê de ku dewlet weke nûnerê gel tê mêzekirin, dewlet berpirsê parastin û tenahiy gel e jî. Yan bi zimanê xelkê sivîl, dewlet bavê gel dihesibe ku bab jî tu caran kîn û kederê ji zarokên xwe nagire, lê mixabin ev yeka derheq rerîma Komare Îslamî ya li Îranê de rast berevajî ye, ji ber ku rejîma Îranê her di gavên yekem de dayê xuyakirin ku bi ser xelkê de hatiye sepandin, çimku her tim li hember gel û pirsgirêkên ku xwe ji gel re çê dike de, di hizra tolstandinê de bûye, îca her carê bi mihaneyekê û peydakirina alevekê. Mînak zaf in, em gelek dûr naçin, em dê balê bikişînin ser pirsên ku îro ratstî gel nemaze li Kurdistanê de hatine û di rojevê de ne, pirsgirêka nebûna şewatê di destpêka demsala sir û seqema zistanê de. Her çend ku eva edetê hemû salan yê rejîmê ye di vî wextê salê de.

Gelo li vir de gelik pirsiyar digihîjin mejiyê meriv, ma heke rejîm di hizra tolstandinê de yan xwe bi ser xelkê de sepandinê de nebe, çi pirsek din heye?! Ma ne Îran di rêza herî pêş ya çavkaniyên gaz, nift û ... di Rojhilata Navîn de ye. Ne ku boriyên nift û gaza Îranê bi sedan kîlometran xêncî axa welat li herêmê de jî belav bûne, ne wisan e ku dengê gemî û tankerên niftkêş ên Îranê li erd û esmanan de xev li çavên lorîkên şîrmij jî



**Pirsgirêka şewatê li bajarên Kurdistana Îranê jiyana xelkê bi dijwariyan re berbirû kiriye**

difikirin ku li sir û seqema zistana biniya çiyayên Zagrosê de tenê birîna şewatê ye ku dikare givaşê bixe ser gel û nemze gelê Kurd. Wih ye jî ku em hemû rojê şahîde bê nift û gaziyê ne li bajarên Kurdistanê de, lê çima rejîm tenê li axa kurdistanê de neçar û bê desthilat e li hember qutbûna nift û gazê de, çima li bajarên din ên Îranê de em kêm caran şahîdê vê pirsgirêkê ne. Ne gelo, rejîm li hizra tolstandinê de ye ji gelê Kurd. Eva tol û heyfa serhildanên par, pêrar û hemû salan e, heyfa pêşwazînekirina gelê Kurd ji Serok Komarê rejîmê ye ku rejîm ji xelkê Kurd distîne.

herimandine?! Gelo heke rejîm, rejîmeke gelî û demokratîk be, rejîmek ku bi dengê gel nûnerayetiya gel di asta navneteweyî de bike, rejîmekê ku serçave û samaneke wiha li ber dest de hebe, tu bêjî li çareserkirina pirsgirêkên gel xasman jî pirsgirêkek ku pêwendî bi samanekê hebe ku li seranserê welêt de ji ava vexwarinê jî erzantir bidest bikeve, aciz û neçar be?!

Dewleta Îranê îro qenc dizane ku êdî tu hitbar û pêgehek di vana gel de nemaye û hemû pîlanên wê ji xelkê re eşkere bûne. Xwenîşandanên peyhev yên gelên Îranê mêze dike, meşên xwendekarî dibîne, serhildanê li seranser axa Îranê de seh dike. Bo mînak serhildanên xelkê Kurdistan, Azerbaycan, Loristan, Xozistanê û ..., dinihêre. Lewma ye jî her tim li şûn peydakirina alevekê ye ku bikare bandoreke mezin bixe ser gel û çavtirsandî bike. Rayedarên rejîmê Rejîmkê ku heya niha nekariye bi girtin û kuştina xelkê azadîxwaz yê Kurd serhildan û xwestekên wan yên berheq û rewa ji ortê rakê, di hizra xwe de wiha dihesibîne ku dê bikare bi qutkirina şewatê vî gelî serkut bike. Çawan ku em dibînin gelê Kurd heta li ber vê zextê û sedan zextên ji wê dijwartir jî dest li xebat û tekoşîna neteweyî û welatparêziya xwe bernedyîne û nadin, her serhildanên vê dawiyê yên gelê Kurd li hember nebûna şewatê, şaşî û çewtbûna rejîmê pê re selimandine ku Kurd li hember zext û tund û tûjiyên dijwartir de jî teslîmê tu rejîmekê nebûye û nabe. Ewa jî hemû nîşaneyên berheqbûna maf û xwestekên gelê in û bihaya azadiyê ye ku gel dide, lê ew in ku nezan û şaş in û ji xwe nahesin, her weke em li Kurdiya xwe de dibêjin ku zana bi îşare û nezan jî bi neqîze.

# Bêbernameyiya Rejîma Îranê Turkiye Berbirûyê Kirîzê Kiriye

Di demekê de ku piraniya bajarên Kurdistana Îranê, di sira çend pile di bin sifrê ya zivistanê de, tevî pirsgirêka nebûn û kêmiya şewatê(bi taybet gazê) berbirû ne, li gor rapora Elî Cewanmerdî, nûçegihanê "Radio Farda"ê li Enqereyê, ragirtina şandina gazê, ji aliyê rejîmê ve ji bo Turkiyê, ev welate tevî kirîzê berbirû kiriye. Sibêdeya roja çarşem, 6'ê Befranbar(27.12.2006)ê, hinartina gaza xwezayî ji Îranê ve bo Turkiyê bi tevahî hatiye ragirtin û eva jî yê bûye sedema rexneyên tund yên çapemenî û ragihandinên Turkiyê ji Îranê û tawanbarkirina wê rejîmê bi bêbernameyî û sozdarneman bi peymanên xwe. Her wiha di ragihandinên Turkiyê de hatiye ku bêbernameyiya Îranê, Turkiye berbirûyê pirsgirêkan kiriye. Wezareta Vejenê a Turkiyê jî diyar kiriye ku eger bilez hinartina gazê ji Îranê ve bo Turkiyê dest pê neke, dê li Turkiyê kirîzeke nû were holê. Li gor rapora nûçegihanê "Radio Farda"ê, karbidestên rejîmê sedemên ragirtina gazê ji bo Turkiyê, sarbûna hewa û jordeçûna asta mifahwergirtin ji gazê li




hindurê Îranê, zanîne.

Hêjayî gotinê ye Turkiye zêdetir ji %70 a vejena xwe ji derve bidest dixe û li gor lihevhatina navbera Îran û Turkiyê, divêt Îran di rojê de 27 milyon lîtran gazê ji bo Turkiyê bişîne. Her wiha kêmbûna hinartina gazê ji bo Turkiye di zivistana borî de, ev welate tûş kirîza kêmbûna vejenê kir.

www.arsivakurd.org

## Êrîşa Hêzên Amerîkayê Bo Ser Binkeya Ajanê Ya Pasdarên Komara Îslamî Li Hewlêrê



Telîs li serê sîxorê Îranê hate xistin

Şeva çarşem, 11.01.2007'an hêzên Amerîkayê piştî haydarbûn ji hebûna şandeke Spaha Pasdaran û hêzên Îstixbarata Komara Îslamî a Îranê li binkeya wan ya li Hewlêrê, seet 3'ê şevê avêtin ser wê binkeyê û hemû kesên ku tê de bûn, bi xwe re birin. Her wiha gelek belgeyên terorîstî û sîxoriyê li wir bidest xistine.

Eva ne cara yekemîn e ku hêzên hevalbend li bajarên Îraqê binkeyên ajan û terorîstiyê yên hikûmeta Îslamî ya Îranê digirin. Her di vê mideha çûyî de li bajarên Besre, Xaneqîn û Bexdayê jî çend deste ji hêzên wan hatine girtin. Eva rastiya vedigere bo siyaseta maytêkirin di nava kar û barên hundir û alîkarîkirin bi deste û taqimên terorîstî yên Îraqê ji bo pêkanîna astengan û dijberîkirin tevî prosesa azadiya Îraqê û demokratîzekirina wî welatî.

Dr. Elîriza Norîzade, rojnamevan û kesaytiyê siyasî yê Îranî di hevpeyvîneke de bi televîzyona "TISHK" re got: "Agahiyên li dor hebûna hêzên îstixbarat û ajanê yên Komara Îslamî ji aliyê wan 5 kesan ji hêzên Amerîkarê re hatibûn dan ku du heftiyan berî niha li Bexdayê hatibûn girtin û 3 ji wan karbidestên leşkerî û ewlekarî yên rejîmê bûn." Dr. Norîzade di vê hevpeyvînê de got: "Binkeya Hewlêrê, bîroyeke Îstixbaratê bû, ne kunsolxaneyek ku karê dîplomatîk bike. Ji sala 1991'an şûn de li bajarên Hewlêr û Silêmaniyê ji hêla rejîma Îranê di binkeyên han de kar û xebat sîxoriyê berdewam tê kirin."

Di navendên han de, her wiha çalakiyên sîxoriyê li dijî hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê li Kurdistana Îraqê û her wiha li ser Kurdistana Başûr jî tên kirin.

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**01.01.1983:** Stûneke hêzên rejîma Îslamî a Îranê li 10 kîlometriya bajarê Bokanê kete boseya Pêşmergeyên PDK Îranê û nêzîkî 100 kes ji hêzên rejîmê rajîmê hatne kuştin û bi dehan tirimbêlên leşkerî ji nav çûn û Pêşmergeyan dest bi ser çek û teqemeniyên zaf de girtin.

Mixabin di vî şerî de 2 Pêşmerge bi navên Seyêd Kamil Mistefa û Osman Sultanpûr Şehîd bûn.

**01.01.1990:** Hilweşîna Yekîtiya Soviyeta berê û pêkhatina çendîn welatên serbixwe.

**02.01.1938:** Destpêkirina şoreşa Dêrsimê. Di vê şoreşê de dewleta Turk bi hêzeke zaf êrîş kire ser şoreşvanên Kurd û pir hov û bêrehmane bi dehan hezar jin û zarokên Kurdan şehîd kirin û agirê şoreşa Kurdan li Dêrsimê temirî.

**04.01.1984:** Li şereke giran a di navbera Pêşmergeyên PDK Îranê û hêzên rejîmê li gundê Ceter a Bakûrê Kurdistana Îranê ku bi heyamê 3 rojan dom kir, bi sedan kes ji hêzên rejîmê hatne kuştin. Mixabin di vî şerî de, 13 Pêşmerge bi navên **Mehmûd Mehmûdzade**, Fermandê Hêza Aware, **Ebûbekir Erdewan**, **Mihemed Bayezîdî**, **Heyder Ehmedî**, **Îdrîs Mirî**, **Kamil Reşo**, **Fîrûz Omerpûr**, **Mizefer Kamiran**, **Mewlûd Ebdulahî**, **Serbaz Ebdulî**, **Silêman Reşîdî**, **Tofiq Bawanî** û **Seîd Mendum** şehîd bûn.

**04.01.2007:** Bo cara yekemîn hunermendê mezin û navdar yê gelê Kurd **Şiwan Perwer** serdana binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê kir.

**06.01.1960:** PDK Îranê îzna xebata eşkere û azad ji hikûmeta Îraqê wergirt û ev yeka bi çendîn salan dom kir.

**06.01.1971:** Helbestvanê Kurd bi navê "Xadim", xelkê bajarê Koyê a Kurdistana Başûr koça dawiyê kir. Navhatî çend pirtûkên dîwanên helbestan piştî xwe bi cî hêla.

**07.01.2006:** Her du seet bernameyên Radyo **Dengê Kurdistana Îranê** li ser "TISHK TV" hate belavkirin.

**08.01.1918:** Serok Komarê Amerîkayê "Wîlson" daxuyaniyek ku di 14 bendan de pêkhatibû da belavkirin ku tê de îşare bi vê çendê hatibû kirin ku hemû neteweyên bê dewlet dikarin dewleta serbixwe hebin.

**08.01.1983:** Pêşmergeyek bi navê **Omer Samî** ku yek ji fermandê Hêza "Efşîn" bû li devera Deştebêlê de şehîd bû.

**08.01.1996:** "Firansoa Mîtran", Serok Komarê berê yê welatê Firansayê û dost û dilsozê herî nêzîk yê miletê Kurd koça dawiyê kir.

**09.01.1946:** Pêşewayê neteweya Kurd, "Qazî Mihemed" ku ji aliyê hêzên rejîma Paşayetî ve hatibû girtin, gelek dilêrane û bi serbilindî ve di dadgeha vê rejîmê de ku pitir ji 14 demjimêran dom kir, berevanî ji miletê xwe û xwe kir û qet li hember xastikên rejîmê de serê xwe neçemand.

**09.01.1996:** Taqimek ji Kadro û Pêşmerge piştî 8 salan cudabûn ji PDK Îranê, carek din bi neçarî û bi egera wê çendê ku nekarîn xwe xwedî bikin û kesê piştevanî ji wan nekir, vergeriyane nava PDK Îranê. Divê ev çenda were gotin ku ev taqima careke din di roja 06.12.2006'an cudabûna xwe ji PDK Îranê îlan kirin.

**10.01.1920:** Civata Neteweyan li Jinêv de dest bi şol bû.

**10.01.1910:** Pêkhatina civata "Hivî" di Kurdistana Turkiyê de.

**10.01.1945:** Weşandina yekemîn hejmara rojnameya "KUDISTAN"ê li bajarê Mehabadê.

**10.01.1984:** Di şereke dijwar û giran de li gundê Sêkaniyana bajarê Şinoyê tevî hêzên rejîmê de fermanderê Hêza Şehîd "Simko" bi navê **Mihemed Pîrot**, tevî sê Pêşmergeyên din bi navên **Hemze Hemzezade**, Serpel, **Ebdulrehman Husênperî** û **Letîf Hesenfer** şehîd bûn.

**11.01.1937:** Rêberê PDK Îranê Şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî li gundê Terex ya bajarê Bokanê li malbateke zana û welatparêz de ji dayîk bû.

**11.01.1983:** Li ser rêya bajarê Şino- Nexedê, di şereke giran de ku pitir ji 50 kes ji hêzên rejîmê hatin kuştin, mixabin 4 kes Pêşmerge jî bi navên **Qasim Ezîzî**, **Mihemed Mehmûdiyan**, **Rehîm Bapîrî** û **Rehîm Oqabî** şehîd bûn.

**11.01.2007:** Hêzên Amerîkayê li bajarê Hewlêrê avêtin ser binkeya îstixbarat û sîxorî ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê û hemû karmendên wê girtin.

**12.01.1985:** Hevalê xebatkar, **Ebas Ekremî** Fermanedeyê Hêza Efşîn li Mîrseya devera Hevşarê de şehîd bû.

**12.01.1992:** Rojnameya "Kurdistanî Nwê" ji aliyê YNK'ê ve hate çap û bilavkirin.

**12.01.1998:** 19 welatan di biryarnameyekê de ragihandin ku kopîkirina mirovan qedexe ye.

**12..01.2006:** Her 3 welatên Ewropayî( Firansa, Almanya û Birîtanya)ragihandin ku gotûbêj li ser dosyeya Etomî ya Îranê gihîştiye dawiyê û me nekarî tu rêçareyekê derheq çareseriya vê pirsê peyda bikin, lewra hewce ye dosyeya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî were şandin.

**13.01.1984:** Hêzên rejîmê di êrîşeke giran de bo ser devera Şamat a bajarê Mehabadê de, tevî berxwedaniya Pêşmergeyên PDK Îranê berengar dibin. Di wî şerî de ku bêtir ji 6 demjimêran domand, zêdetir ji 120 kes ji hêzên rejîmê hatine kuştin. Mixabin 5 Pêşmergeyên qehreman bi navên: Omer Mengar, Riza Pîrotî, Lawe Paçîde, Rehman Meirofî û Seyîd Husên Îbrahîmî şehîd dibin.

**14.01.2004:** Hunermendê dengxweş û binav û deng **Karapêtê Xaço** di jiyê 103 saliyê de koça dawiyê kir.

**15.01.1915:** Yekemîn axaftina bi telefonê di navbera Eliksander Grahambir û Tomas Aston de hate kirin.

**15.01.1951:** Dr. Musediq , Serok Wezîrê Îranê biryara daxistina giştî konsolxaneyên welatê Birîtanyayê li Îranê de da. Ew biryar bi sedema destêwerdanên wî welatî di kar û barên Îranê de, bi taybet li warê Niftê ve hate girtin.

# Konferansa: "Turkiye li Aştiya xwe digere" li Enqereyê hate lidarxistin

**Di navbera rojên 13-14.01.2007'an Konferansa:**

**"Turkiye ji aştiya xwe digere" li Enqereyê hate lidarxistin. Di konferansa "Turkiye li aştiya xwe digere" de, gelek siyasetvan, akademîsyen, hunermend, wêjevan û navdar cih girtin.**

**Di nava Beşdaran de nivîskarê navdar û siyasetvanê navdar yê Turk û dostê Kurdan, Yaşar Kemal axaftinek dîrokî û girîng di destpêka vekirina konferansê de kir. Li vir nûçeya taybet bi vê mijarê tê weşandin ku me ji "Azadiya Welat/ ANF"ê wergirtiye.**

Konferansa Aştiyê ya ku ji hêla rewşenbîran ve li Enqereyê hate lidarxistin, bi axaftina nivîskarê navdar Yaşar Kemal dest pê kir. Yaşar Kemal, di axaftina xwe de got ku **"hûn çi dikin bikin bi rûmeta mirovekî û bi rûmeta gelekî nelîzin"** û ji pirsgirêka kurd re çareseriyeke demokratîk xwest.

Yaşar Kemal ku axaftina xwe li ser bingeha **"An demokrasiyeke rast an jî hîç"**, di konferansê de axftineke dîrokî kir. Yaşar Kemal, bi gotinên Mustafa Kemal ku di sala 1923'yan de ji kurdan re soza muxtariyetê dabû dest bi axaftina xwe kir. Kemal, bi bîr xist ku... rêveberiyên ku piştî Mustafa Kemal hatine, soza ku dane kurdan ji bîr kirine û wiha axivî: **"Sedsala 20'an bi mirovan êş û elemên mezin da kişandin. Şerê yekemîn û duyemîn ên cîhanê û şerên sar, êş û elemên mirovan zêdetir kirin. Ev 25 sal in ku li hemberî kurdan şerekî tê meşandin. Lê nediyare ka dê ev şerê li hemberî kurdan kengê biqede."**

**PIŞTA TIRKIYEYÊ ŞIKAND**

Yaşar Kemal, bal kişand ku hin kes şerê li hemberî kurdan wekî 'şerê biçûk' û 'nerm' dinirxînin û axaftina xwe wiha berdewam kir: **"Neteweperestên nijadperest ên Tirkiyeyê hene. Ew şer dixwazin. Her çiqas agirbest hatine îlankirin jî ev şer dewam dike. 5 hezar malên gundan hatin şewitandin. Mirov ji ber tîbûn û birçîbûnê şerpeze bûn. Kuştinên kiryar nediyar êdî bûn kuştinên ji rêzê. Vî şerî pişta Tirkiyeyê şikand."**

**ŞER DÊ TIRKIYEYÊ BIRIZÎNE**

Yaşar Kemal, bal kişand ku hin derdor ji gerîla re dibêjin terorîst û wiha axivî: "Di vî şerî de, ji gerîlayan re gotin terorîst. Ji vê yekê jî hêvî dikin. Ewropayiyan jî ev yek fêm nedikirin. Digotin qey ev şer maceraya ciwanan a gerîlatiyê ye. Lê îro çapameniya cîhanê hemû tiştî dizane. Ger ku ev şer dewam bike, dê ev şer Tirkiyeyê birizîne. Kes dê nikaribe ji binê vî şerî derkeve."




Yaşar Kemal: "Di sala 1923 Ata Tirk soza otonomî da Kurdan"

Nivîskarê navdar, bi bîr xist ku Anatoliya Rojava û Herêma ku kurd lê dijîn, dergûşa şaristaniyê ye û gotinên xwe wiha anî ziman: "Ev ax, Mezopotamya, ev mirov xwedî dewlemendiyên mezin bûn. Ev der wiha feqîr û xizan nebûn. Lê ev gel ji axa xwe hate sirgûnkirin. Bi her tiştên xwe, ji tûnebûnê re hatin mehkûmkirin. Ger ku di vê yekê de israr bikin, kes nizane dê ev şer bi ku de biçe."

**'BI RÛMETA GEL NELÎZIN'**

Yaşar Kemal, di axaftina xwe de got ku "hûn çi dikin bikin bi rûmeta mirovekî û bi rûmeta gelekî nelîzin" û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Halbûkî kesên ku Tirkiyeyê bi rê ve dibin, her tiştî anî serê gelan û mirovan. Dibêjin 'ji xeynî tirkan dostê tirkan tune ye' Na, ne wisa ye. Ji xeynî tirkan, dostên tirkan hene. Kurd ji Melazgirê heta şerê rizgariyê (şerê îstîklalê) dostê tirkan ne."

Yaşar Kemal, di axaftina xwe de li ser pêvajoya Kongreya Erziromê û çûna Mustafa Kemal a Samsûnê jî sekinî. Nivîskar Kemal, da zanîn ku dostaniya kurdan a vê demê, tesîreke mezin li ser avabûna Tirkiyeya niha kiriye. Hin kes dibêjin ku kurd dixwazin Tirkiyeyê parçe bikin. Kesên ku van gotinan dibêjin, belkî jî tu tiştekî nizanin. Dîrokê nizanin. An haya van kesan ji dostaniya kurdan a bi tirkan re tune ye yan jî dizanin, lê wiha dibêjin. Belkî ji ber van gotinan hin kes min wekî qehremanekî bibînin. Lê em li vir behsa aştiyê dikin. Ez ne qehreman im. Ez nivîskarek im, li ser jiyana vî gelî dinivisînim. Ez van gotinan dibêjim; çimkî dilê min diêşe. Şerm e. Ma bira van tiştan tîne serê birayê xwe."

**AN DEMOKRASÎ AN HÎÇ**

Yaşar Kemal, înkara li ser çand û zimanê kurdî jî bi zimanekî tûj rexne kir û bal kişand ku kurdî zimanekî pir dewlemend e. Kemal, ev tişt gotin: "Di kurdî de gelek zarava hene. Ev jî îsbata dewlemendiya zimanê kurdî ye. Ji sedsala 15'emîn heta roja me, gelek destanên mezin, berhemên dîrokî, helbestvanên mezin û bi sedan pirtûkên kurdî derketine." Yaşar Kemal, di axaftina xwe de navê wêjevanên mezin ên kurd jî rêz kirin û wiha axivî: "Feqiyê Teyran helbestvanekî mezin e. Li Kirgizistan û Îrlandayê, mîrateyên hêja yên ji vê çandê hene. Feqiyê Teyran û çandên bi vî rengî, rola van a di çanda mirovatiyê de pir girîng e."

Yaşar Kemal, ji bo cîhanê gotina "Dinya baxçeyek çandê ye û ji hezaran kulîlkan pêk tê" bi kar anî û wiha pê de çû: "Divê bi çanda kurdan re têkiliyeke bingehîn bê danîn. Divê em nan, rûmet û çanda welatê xwe rizgar bikin. Divê ev pirsgirêk bi riyên aştiyane û demokratîk çareser bibe." Yaşar di dawiya axaftina xwe de, sê caran ser hev gotina "An demokrasiyeke rast an jî hîç" bi kar anî.

**ÇÛ BA DAYÎKÊN AŞTIYÊ**

Kesên ku salona konferansê dagirtin, bi deqeyan li ser piyan, ji bo axaftina nivîskarê navdar Yaşar Kemal, li çepikan xistin. Çapameniyê jî bi eleqeyeke mezin axaftina Yaşar Kemal guhdarî kir. Yaşar Kemal piştî axaftina xwe, çû ba Samî Selçûk rûnişt. Kemal, piştre çû ba dayikên aştiyê rûnişt û bi wan re sohbet kir. Dayikek aştiyê laçikek spî ku temsîla aştiyê ye, xist stûyê Yaşar Kemal.

www.arsivakurdi.org

# Pêvajoya Xebata Jinan Di Îranê De

**Hemîd Muxtarî**

Hemû mirovek azad ji dayîk dibe û xwediyê mafê wekhev e. Rêzgirtin ji bo bihagiraniyên zatî û kesayetiya mirovî ya hemû kesekê ji esasên bingehîn û neguher yên mafên mirovan e, lewma danîna ferq û cudahiyan di navbera jin û mêran de sûç tê hesibandin.

Îro rojê serbarê wê ku guhertin bi ser rola kevn ya jinan di civakê de hatiye û zaf welatan Wekheviya jin û mêran qebûl kiriye, lê mixabin dîsan jî hebûna cudahîdanan di navbera jin û mêran dikeve ber çawan û bûye bi pir niqaştirîn pirs di asta cîhanê de.

Di rastî de tund û tûjî li dijî jinan di hemû cîhanê de tê dîtin û li gor çavkaniyan, ji her 3 jinan di cîhanê de, aliyê kêm jinek di pêvajoya jiyana xwe de tûşî tund û tûjiyê bûye û ketiye




ber destdirêjiyan. Yan jî di warê zayendî û regezî ve mifaha nebaş û xirab jê hatiye wergirtin. Bi xasmanî jin li herêmên paremayî di warê zanistî û xwedî kirîz û ne ewle (yanî herêmên ku şer têde heye), dikevine ber tund û tûjiya zayendî.

Li welatê me anku Îranê de li mêjdem e ku jin ji mafê wekheviyê bêpar mane û di civakê de ketine perawêzê. Lê çima jinên me di Îranê de zêdebarê hebûna dîrokeke dirêj ji xebat û cangoriyan heta niha jî ji mafê xwe bêpar mane?!

Ger em lênihêrînekê bi ser dîroka xebata civakî heta ew ciyê ku dîrok tîne bîra me bikin, ji me re eyan dibe ku jinan herdem li dijî zirûfa nebaş ya jiyana xwe xebat kirine û gelek bikêmî bizav û şoreş di Îranê de tên dîtin ku jinan têde rol nebe.

Jinên Îranê herdem mil bi milê mêran li dijî sîstemên dîktator û dijî mirovî xebat kirine, lê mixabin nekarîne xwestekên xwe yên sereke bi destve bînin. Bo mînak şoreşa sala 1357 (1979)'an ku bû sebebê hiloşîna rejîma Paşayetî û bidestvegirtina desthilatê ji aliyê rejîma Melayan. Di vê şoreşê de jinên Îranê xwediyê roleke girîng û bingehîn bûn, lê mixabin piştî ji nav çûna rejîma Şah, heta ew mafên ku li dema desthilatdariya rejîma Şah de jî hebûn, ji dest dan.

Li vir pirsyarek tê holê, çima xelkê Îranê bi giştî û bi taybetî jinên Îranê nekarîn daxwazên xwe bidestve bînin?! Erê gelo daxwazên wan hiloşandina rejîma Paşayetî û hatine ser şola sîtemeke demokratîk nebû ku di çarçoveya wê de, mafên hemû mirovekê were dabînkirin?!

Bersiv rohn û eşkere ye, nebûna pirogiram û bernameyeke bingehîn û diyarîkirî, diyar nebûna xwestekên xelkê bi xasmanî jinan, herwisa li berçavnegirtin û girîngî pênedana partiyên siyasî yên vê demê bi daxwazên tex û qatên civakê bi taybetî jin û ciwan û ... hemû evana bûne sebeb ku rejîmeke han were ser kar.

Piştre vê rejîmê bi pejirandina yasaya bingehîn a xwe ne tenê jinên Îranê, belku hemû tex û qatên vî welatî weke netewe, xwendekar, karker, rewşenbîr, ciwan û ... xistin ber zext û givaşan û her dengeke azadîxwazane di Îranê de tepeser dikirin, bi xasmanî jinên Îranê ku di vê yasayê de bi eşkere ketine ber bêhurmetiyê. Lê evane nebûna sebeb ku jinên xebatkar û azadîxwaz di Îranê de dest ji xebatê berdin û serê xwe ji bo xwestekên vê rejîmê bitewînin û tenê mijûlê kar di malê de û xwedîkirina zarokan bibin. Belku berevajî, jinan pêvajoya xebata xwe xurttir kirin û bi bername û pirogramên usûlî û pêşkevtî ve hatine qada xebatê û karîn zaf guhertinan di civakê de pêk bînin û bibine xwediyê zaf destkevtan.

Bo mînak wan karî bi jêhelbirina astê xwendina xwe di heyamê van 28 salane de, bibin sebebê kêmrengkirina nexwendewariyê di nava jinan û niha pitir ji 65 ji sedê ya xwendekar û şagirdên Îranê keç in. Yan jordeçûna astê daxwaza cudabûnê (telaq)ê ji aliyê jinan ve (pitir ji %40) li halekê de ku jinên Îranê ne xwediyê mafê ji hevveqetiyanê ne. Evane nîşaneyên cehd û tekoşîna jinên Îranê ji bo bidestveanîna serxwebûnake zêdetir e. Bizava niha ya jinan di Îranê de daxwazkarê azadiya jinan ji hemû qeyd û bend û bihayên li dijî jinan, pêkanîna reformên çandî di bîr û rayan û ji nav navbirina bihayên mêrserdestî û olî ye. Xurt û zêdebûna weşanên jinan, wêblagan, nivîs û wergerandina pirtûkên li ser pirsa jinan, nîşaneyek din a xebata jinan e.

Rola jinan di diyarîkirina siyasetê de, pişikdariya bi milyonan ya jina di hilbijartinan de, zêde bûna berbiçav a hejmara jinên berbijêr û serkevtina wan di hilbijartinan de, nîşaneya geşekirina astê siyasî ya jinan di civaka me de ye.

Girtin û birêvebirina cejna roja jinan, konferans, semînarên navxweyî û derveyî li dor pirsên jinan û zaf xebatên din ku li vê gotarê de cih nagirin, hemû nîşanê vê hindê ne ku bizava jinan di Îranê de xwediyê bandor û li halê berfirehbûnê ye û Îro rojê pitir ji her her demekê azadiya wan tevlî pêvajoya misogerbûna modernîte û demokrasiyê ye.

# Hejmara Tûşbûyên Nexweşiya Îdzê Gihîşte 14090 Kesan Di Îranê De



Li gorî serhejmariyên dawiyê, hejmara tûşbûyiyên nexweşiya Îdzê, heta bervara 01.10.1385 (22.12.2006)'an gihîşte 14090 kesan di Îranê de. Li hejmara han heya niha 1760 kes bi hegera vê nexweşiyê jiyana xwe ji dest dane.

Ji hejmara 14090 tûşbûyiyên vîrûsa "HIV"ê û Îdza hatî dîtin heta niha 13308 kes anko 94.44 ji sedê mêr in û 782 anko 5.66 ji sedê jin in. Herwiha ji 864 kesên nexweşê Îdzê di welêt de 789 kes wate 91.33 ji sedê mêr û 75 kes wate 8.77 ji sedê jin in.

Li gorî vê rapora serhejmariyê, hejmar miriyên bi hegera Îdzê heya niha 1760 kes hatiye zanîn ku ji vê hejmarê 1695 kes (%96.33) mêr û 65 kes (%3.77) jin in. Serhejmariyên vê dawiyê eyan dikin tûşbûyên "HIV"ê li gor zayend û temen, li astê temenê li navbera 25 heta 40 saliyê de, 4407 kesin, wate 40.88 kes ji sedê. Astê 35 heta 40 saliyê zêdetirîn hejmara nexweşan bixwe ve girtiye (3338 kes, wate 30.99 ji sedê). Li gor raporan rêya belavbûnê ya herî berçav a nexweşiyê îtiyad a di rêya derziyan de hatiye naskirin (66.99 li sedê). Rêyên din ên nenaskirî ku qasê 25.55 ji sedê hatine zanîn wiha hatine:

Têkiliya zayendî 7.55 ji sedê
Dan û standina xwînê 1.77 ji sedê
Dayîk bi zarok 0.5 ji sedê
**Malpera "akhbar-rooz"**

# Îdamkirina Welatiyeke Kurd Li Kamyaranê



Li gor nûçeyeke gihîştî bi "Kurdistanmedia" ê,welatiyek bi navê **Nasir Batmanî**, 22 salî, yê bajarê Kamyaranê, çend rojan berî nihai girtîxaneya bajarê Sine de hate îdamkirin.

Hêjayî gotinê ye ku navhatî 5 salan berî niha bi buxtana kesekê hatibû girtin.

www.arsivakurd.org

# Di Edebiyatê De Forma "Ez"

**Lokman Pûlat**

- 1 -

Divê berhemên tu nivîskarekî li gor şexsiyeta wî yan jî li gor jiyana wî ya rojane û kar û xebatên ku nivîskar li derveyê nivîskariya xwe pêre mijûl dibe, neyê nirxandin. Herweha divê nivîskarekî li gor naveroka berhema xwe neyê bi navkirinin.

Nivîskarekî dema bi forma ″Ez″ helbest, çîrok yan roman binivîse, divê neyê fêmkirin ku ew ″Ez″ nivîskar bi xwe ye. Hinek nivîskarên mêr bi forma ″Ez″ lê bi devê jinek çîrok dinivîsin, hinek jin bi devê mêrekî çîrok yan roman dinivîsin, di wir de ″Ez″ nivîskar bi xwe nîn e.

Min bi forma ″Ez″ çîrokek nivîsî. Di çîrokê de dilê mêrekî çil salî dikeve keçeke bîst salî. Ew herdu aşiqê hevûdu dibin. Dostekî min vê çîroka min xwend û ji min re got : ″Tu mirovekî çil salî, te dilê xwe xistiye keçika bîst salî.″ Ji bo wê jî min pêwîst dît ku li ser navê weşanxanê vê têbinîyê bidim nivîsîn û di destpêka pirtûkek xwe de bidim weşandin. Ew têbinî, anku balkêşiya weşanxanê weha ye

*"Balkêşî :*

Kurteçîrokên ku di vê pirtûkê de ne û bi forma "Ez" hatine nivîsin, dibe ku ji alî xwendevanan ve şaş bê fêmkirin û ew bibêjin qey ew "Ez" nivîskar bi xwe ye. Tu eleqeya nivîskar bi "Ez" a ku di kurteçîrokan de têt qalkirin tune.

*Weşanên Helwest"*

Dema nivîskarekî di berhemeke xwe de behsa tişteke bike, nayê wê manê ku nivîskar wê tiştî bi xwe kiriye, yan jî nivîskar wê tiştî di jiyana xwe ya rasteqîn de pêk aniye. Nivîskar "Jane Austen" di jiyana xwe de qet nezewiciye, lê ew di berhema xwe ya edebî de bi forma "Ez" behsa zewaca xwe dike, bê çawa zewicî ye û çi hatiye serî.

Nivîskarê Îngilîz ê navdar Oscar Wîlde di jiyana xwe ya rasteqîn de mirovekî homoseksuel bûye. Têkiliyên wî tim bi mêran re, bi lawikan re hebûye, ne bi jinan re. Lê, wî di berhemeke xwe de bi forma "Ez" behsa evîna xwe û jinek kiriye. Lê, di esasê xwe de ew aşiqê tu jinek nebûye. Wî ji lawikan hez kiriye, bi wan re têkiliya cinsî pêk aniye.

Berhemên nivîskaran û jiyana wan a rasteqîn li hevûdu naquncin, ev tişteke normal e. Nivîskar mecbûr nîn e ku realîteya jiyana xwe ya rasteqîn têxe nav berhemên xwe. Di cîhana romaneke de, yanî cîhana ku nivîskar bi xwe, bi şêweya fictîon diafirîne de, dibe ku gelek tişt hebin ne bi dilê nivîskar be, ne li gor pîvanên wî yên exlaqî be, lê ji bo ku pêkanîna cîhana fictîon weha pêwîst dike, ew wan tiştan jî dixe nav cîhana xeyalî.

Nivîskarekî dema berhem biafrîne, dibe ku hîsên xwe têxe nav berhemê, lê ev nayê wê maneyê ku, wî di jiyana xwe de tiştek weha kiriye, yan jî ew dê di rastiya jiyana xwe de tişteke weha bike. Min di gelek çîrokên xwe de bi forma "Ez" gelek tişt bi lehengên çîrokan daye kirin. Helbet ew "Ez" ê çîroknivîs, anku nivîskar nîn e. Tiştên ku min bi lehengên çîrokan daye kirin, ez di jiyana xwe ya rasteqîn de qet nakim. Lê temaya çîrokê û hunandina wê weha pêwîst bûye û loma jî min weha bi wan daye kirin, weha nivîsiye.

Di çîrok û romanên modern de forma "Ez" pir tê bi kar anîn. Min jî di hinek çîrok, roman û kurteromanên xwe de ev forme bi kar aniye. Bila hinek wê forma "Ez" ji min re nekin mal, bi min ve nedin girêdan.

- 2 –

Di edebiyatê de forma "Ez" li xweşa xwendevanan jî diçe. Xwendevan di wê "Ez" ê de carna xwe dibînin. Helbet girîngîya forma "Ez" ji aliyê edebiyatê û teknîka nivîsîna edebî ve heye. Di vê formê de çîrok ji devê yê ku ew bi xwe lehengê çîrokê ye, tê qalkirin. Bi çavên wî li tiştan tê nêrîn. Bûyerên ku diqewimin, tiştên ku pêk tên, hemû bi devê yê ku beşdarê wan tiştan dibe, tê qalkirin. Di forma "Ez" de ji bo ku hem ew kesê ku qal dike û hem jî kesê ku di nav çîrokê yan romanê de ye, eynê kes in, lewra herikandineke zindî derdikeve holê.

Dema di berhemeke edebî de mirov vê hevokê bixwîne "Ez havînê li Başûrê Kurdistanê bûm. Min gelek bûyerên ecêb dît, ez di nav jiyana xwe ya rojane de gelek tişt jiyam û bûm şahîdê gelek tiştan." Û di berhemê de bi forma "Ez" ev tişt dema hate qalkirin, yê ku wan tiştan dibîne û bi aktîv di nav bûyeran de cih digre, ew bi xwe bi forma "Ez" behsa wan tiştan dike.

Li vir, ew "Ez" nivîskar bi xwe nîn e. Nivîskar belkî qet neçûye Kurdistana Başûr jî. Lêbelê, ew bi devê leheng û bi forma "Ez" berhema xwe diafrîne. Robînson Cruseo berhemeke navdar e û li gelek zimanan hatiye wergerandin. Robînson Cruseo nivîskarê berhemê bi xwe nîn e. Robînson bi salan li giravek di nav bahrê de dimîne û behsa jiyana xwe ya rojane a giravê dike. Ew dema behs dike, bi forma "Ez" behs dike. Nivîskarê berhemê Defaou belkî qet neçûye û di giraveke weha de bi tena serê xwe nemaye.

Di temamê çîrok û romanan de miheqeq yekî gotubêj anku yê ku qal dike, gotinbêjek heye. Ev gotinbêj qalkirina xwe, vegotina xwe bi kîjan formê jî bike, li pey wî nivîskar heye. Nivîskar wekî Xwedayê wî cîhana fictîon e. Ew li her derî ye û li tu derî nexwiyaye. Lê, çawa ku Xwedê însan nîn e, nivîskar jî leheng û fîgurên çîrokê yan romanê nîn e. Li vir mexset nekû romanên bîranînê ne û nivîskar bi xwe bi şêweya romanê bîranînên xwe behs dike û leheng ew bi xwe ye. Helbet hinek romanên biyografîk û otobiyografîk de, nivîskar bi xwe lehengê romanê ye. Lê, li vir mijara vê nivîsê çîrok û romanên ku bi forma "Ez" hatine afirandine.

Çîrok, roman, helbest û teatr, berhemên hest û xeyalên mirov in. Nivîskar bi hest û xeyalên xwe berheman diafirîne. Gelek şêweyên gotinbêjiya berheman heye. Çawa ku nivîskar dikare forma "Ez" bi kar bîne, herweha dikare forma "Ew" jî bi kar bîne. Di forma "Ew" de yê gotinbêj (bi tirkî jê re anlatici dibêjin) li derveyê bûyer û herikandinên çîrok yan romanê ye. Yanî ew bi xwe di nav de nîn e. Ji derve ve behsa wan dike.

Di forma "Ez" de, wext û cih, zeman û mekan, girîng e. Lê, di forma "Ew" de ev girîng nîn e. Yê gotinbêj li derveyê wext û cih e. Ew dikare biçe demên paşerojê û dikare behsa demên curbecur bike. Di kîjan form de dibe bila bibe, di her romanê de divê tasvîr û diyalog hebin. Helbet di hinek romanan de tasvîr zêde ye û diyalog kêm in. Di hinekan de jî diyalog zêde ne û tasvîr kêm in. Wek mînak; di romanên Ernest Hemîngway de diyalog zêde ne, tasvîr kêm in, di yên Orhan Pamûk de, tasvîr zêde ne, diyalog kêm in.



Helbet ji bo bûyerek, qarekterek bê fêmkirin tasvîr pêwîst e, lêbelê diyalog jî pêwîst e.

Helbet di tasvîrê de şert nîn e ku her tişt bê gotin. Ji xwe nivîskar mecbûr nîn e ku hertiştî ji xwendevanan re bibêje. Hinek tişt bê ku hatiye gotin, herwekî ku hatiye gotin, xwendevanan dide fikrandin. Di romana min ya bi navê "Robîn" de, nayê gotin ku Vîyan'ê çima Robîn nekuşt. Nivîskarê romanê nabêje ku; "ka bifikirin Vîyan'ê çima Robîn nekuşt?" Lêbelê ew tişt bê ku bêne gotin, xwendevan meraq dike û difikire, bê gelo Vîyan'ê çima Robîn nekuşt.

Di her vegotinê de sîstemek heye. Her gotinbêj xwedî teknîkeke taybetî ye. Nivîskar dikare xwe li pey gotinbêjê ku bi forma "Ez" , "Ew" , "Hûn" , berhemê rave dike, bide berşêdan. Fonksiyona nivîskar netenê ev e ku; çîrokê, romanê bi devê gotinbêj bide qalkirin. Di gel wê jî, fonksiyona wî/wê ya îdarekirinê, ragihandinê, çavderiyê û amadekirina tasvîrên felsefî heye. Lêbelê felsefe û hizrên ku bi devê leheng yan fîguran bête gotin, nayê wê maneyê ku ew fikrên nivîskar bi xwe ne. Gelek caran fikrên ku ji bîr û baweriyên nivîskar re, ji felsefe û ramanên wî yên şexsî re ters bin jî, bi devê leheng yan fîguran dikare bê gotin.

Hinek nivîskar hene, wek bîr û bawerî çep in, lê di berhemên xwe de cih didin bûyerên û fikrên dînî –olî- yan jî bi devê leheng û fîguran dîtin û ramanên dînî- olî- pêşkêş dikin, lê nivîskar bi xwe wek wan nafikire. Yanî şexsiyet, dîtin û ramanên nivîskar û yên leheng û fîguran pirî caran newekhev in.

Di çîrok û romanê de vegotinbêj dikare xwe derxe pêş jî û dikare xwe bide paş jî û qet neyê dîtin. Ew li gor pêwîstiyê dikare carna xwe derxe pêş, ji bo ku bala xwendevanan bikşîne. Nivîskar li gorê fonksiyona leheng û fîguran ji devê wan, dikare zimanekî giran jî û zimanekî sivik ê gelêrî jî bi kar bîne. Ew dema mirovekî nezan, yan jî mirovekî sade ê gelêrî, gundiyekî bide axaftin, ji devê wan nikare zimanekî giran ê teorîk, yan jî zimanekî entellektuelî bi kar bîne. Divê ziman li gor rewş, qarekter û fonksiyona fîguran bê bikar anîn.

Di berhemên edebî de hêleke girîng jî mesela perspektîfê ye. Nivîskar malzemên destên xwe li gorê perspektîfa xwe bi kar tîne. Yê ku kalîta hunerê û berhemê dide nîşandan perspektîf e. Nivîskar li gor perspektîfa xwe reng dide berhema xwe. Yê ku xwedî perspektîfeke fereh be, berhema wî / wê ji alî naveroka xwe ve berfireh e. Lênêrîna perspektîfî dibe hîmê afirandina berhemê. Metoda afirandinê, teknîka nivîsê li gor perspektîfa nivîskar şikl û reng digre.

www.a-kurd.org

# SÎNOR

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Mirov, ji ber ku tixûban di mêjiyê xwe de datîne, her tiştî li gorî zanîna xwe ya kûd û sînordar disenifîne. Û bi vê feraseta xwe ya teng û têrlewaz dike ku sînorekî li dora bêsînoriyê deyne. Bi rastî ev sînor, sînorê zanîna mirov a kêm û sînordar e. Belê ev fikr û hizra bisînor, sînorekî çêkirî li dora ji zanîn û hişmendiya mirovahiyê datîne.

Li gorî vê ferasetê, tiştek an mezin an jî biçûk e; an kin kin an jî dirêj e; an qels an jî xurt e; an nizm an jî bilind e. Ango tu dibetiyê nade guherbariya mezinahî an jî biçûkatiyê; îhtimalê nade kinî an jî dirêjiyê; mikûniyê nade nizmayî an jî bilindahiyê; gengaziyê nade qelsî an jî xurtiyê. Heçku tiştek hem mezin hem jî biçûk e. Dîsa, hem kin û hem jî dirêje; hem nizm hem jî bilind e; hem qels hem jî xurt e. Bo nimûne, hêştir mezin e; belê heman gavê jî biçûk e. Li gorî çi biçûk, li gorî çi mezin e? An ji çi mezintir û ji çi biçûktir e? Hêştir ji hespê mezintir, belê ji nehengekî(balînayekî) biçûktir e. Dîsa, mar dirêj e; belê heman gavê jî kin e. Li gorî çi dirêj, li gorî çi kin e? Mar ji marmarokê dirêjtir e; belê ji werîsekî kintir e. Her wiha gir bilind e; belê heman gavê jî nizm e. Li gorî çi bilind, li gorî çi nizm e? Li gorî deştê bilind, belê li gorî çiyê nizm e.

Mirov dikare der barê xurtî û qelsiyê, xweşikî û zistiyê, qelewî û lewaziyê, xweşî û nexweşiyê, dûrî û nêzîkiyê, dewlemendî û xizaniyê û hwd. jî gelek mînakên berbiçav bide. Belê encam heman tişt e. Yanî mirov nikare tu sînor û tixûbên misoger li ber tu tiştî deyne. Çimkî her tişt bi reng û awaya xwe, ji dijberê xwe tê cihêkirin û veqetandin.

Başî û nebaşî, qencî û xerabî, rastî û şaşî, heqî û neheqî jî wisa ne. Li gorî nêrîn û feraseta mirovan tişt têne guhertin û têne sînordarkirin. Gelek tişt bi hin mirovan xweş tên dîtin; belê bi hin mirovên din jî nexweş têne dîtin. Dîsa gelek kiryar bi hin kesan wekî tiştên baş têne qebûlkirin; belê bi hin kesan jî wekî tiştên xerab têne qebûlkirin. Her wiha gelek tiştên ku ji hêla hin mirovan ve wekî neheqî têne dîtin, ji hêla hin mirovan din jî tê kirin, ji hêla hin mirovên din ve jî wekî heqdarî têne pejirandin. Ango rastiya hin kesan, dibe şaşiya hin kesên din. Guherbarî her gav dibe sedema dualîbûna tiştan jî. Ji bo wê, ji bilî rêbaz û qalibê formulasyonên derezanistî her tişt guherbar e. Û tu sînor ji bo wan tiştan nîn e. Sînorê ku li dora wan têne rapêçandin jî, sînorên ku di hiş û mêjiyê mirov de hatine danîn in.

Ji ber ku sînor li ber hest, hêz û hizra mirov hatine danîn, ew nikare xwe rakêşe derveyê van sînorên çêkirî û guherbar. Ji jiyana mirov bigirin heta bejn û bala mirov, ji mala mirov bigirin heta, mal û milkê mirov, ji axaftina mirov bigirin heta fikr û ramana mirov, ji xaka ku mirov bigirin, heta gund û bajarên mirov, ji erdnîgariya mirov bigirin heta welat û niştimana mirov…her der û her tişt bi sînorên stûr û çêkirî hatine dorpêçkirin û fesilandin. Tu tişt nemaye ku sînor jêre nehatibe danîn.

Ji do heta îro, tiştên ku mirov arasteyî perestin û hebandina zordarî û desthilatdariyê dikin jî dîsa ev sînorên ku li ber hêz û taqeta mirov hatine danîn in. Ji roja ku mirov bi mirovahiya xwe hesiyaye û heta îro, ji ber hizr û zanîna xwe ya bisînor, an hawara xwe kiriye hêzeke bêsînor an jî xwe spartiye xweda(yekî) an jî xwedewendek e ku sînor ji hêz û heza wî/wê re tune ye. Singê Gelek sînorên bistrî yên ku mirovahiyê di mêjiyê xwe de raçikandine hin bi hin riziyane. Belê dîsa jî li dewsa wan sînorên bistrî, sînorên ku bi sedan sal neyên rûxandin di navbera xwe û hemcinsên xwe de daniye. Her ku zanîn û hizra mirovahiyê pêş de çûye, hin sînorên kevn rakirine, belê li dewsa wan, sînorên xurtir û kambaxtir ava kirine. Ev sînor, sînorên ku mirov ber bi benîtî, koletî û dîlîtiyê vedikin bi xwe ne.

Sînorên ku mirov di hizr û kiryarên xwe de pêk anîne, bûne sînorên zanîn û hişmendiya mirova bi xwe. Belê her çendî ku ev sînor hin caran hatibin firehkirin û dorhêlkirin jî, bi tevahî ji holê ranebûne. Ew sînorên ku îro li ber her tiştî û her têgihê hatine danîn, berdewama wan sînorên çêkirî yên ku dî goşa xwezaya bêsînor de mirovahiya hemdem ditengijîne û diesirîne ne. Ev sînorên çêkirî û demdemî ne derfetê dide azadbûna mirov û ne jî jîn û giyana wî/wê.

Kaniya Helbestan

## HEVALÊN MİN



**Sadiq Eskerî**
sadbes@yahoo.com

Duh min di hembêza diya xwe da dizî
Pariyek nanê hişk û zaha
Çelpek bêhna evîna daykatiyê,
Duh min li kêlega qebrê babê xwe dizî
Tasek ava tezî û cemidî
Paşelek xweşmêrê û egêtiyê
Min parvekır ser hevalan
Heya birçî nebin li ser çiyan
Nekêşın hesreta hembêza daykan
Têhnî nemînin li payze varan
Netirsın ji hoviya neyaran.

Lê hevalên min ne ji minin
Bi guran re diçin rêyan
Li pişt ji min dixin kêran
Li şîniya babê min digrin dîlan

Duh êvarî gava baran dibarî
Diya min bi baranê re digriya
Duh gava baran dibarî
Diya min xwe xist hembêza çiyan
Çiyayek hembêz kir û digot:
Bila necemidin lavên min
Netirsin ji tariya şevê
veneciniqin ji hoviya dujmin

Lê diya min şaş bû
Ev ne lavên wê bûn
Ev ne egîdên caran bûn
Ev ne ji wanin birêsin destana xweşmeriyê
Ev ne ji wanin ji erdê rakin tola xûna babê min
Ev ne ji wanin şerê tarîtiyê ji bo hatina roniyê bikin

Diya min şaş bû
Hevalên min birên gurane
Bila herin
Bila herin di tariya şevêda nuqum bin
Bila herin
Rêya pêvayi nivîya rêya wan be
Bila herin
Tola babê min ji erdê namîne
Bila herin
Hisreta diya min di dil de namîne.

*Meram ji diya min PDK Îranê ye*
*Meram ji babê min rêberên şehîd e*

www.arsivakurd.org

**Derhêner Seyfedîn Cebarî:**

# “Sînemaya Kurdî Hêj Negihîştiye Asta Baş Û Pêwîst Ya Îroyîn”

Di navbera rojên 25 – 28.12.2006’an de li jêr çavdêriya Wezareta Rewşenbîrî ya Herêma Kurdistanê, yekemîn Festîvala Navneteweyî a kurtefîlman li Hewlêrê birêve çû. Di vê festîvalê de nêzîk 50 kurtefîlman beşdarî kirin. Di dawiya Festîvalê de hin berhem hatine xelatkirin, ku yek ji wan kurtefîlma bi navê “Kamêra” bû ku ji aliyê derhênerê Kurd, Sefyedîn Cebarî ve hatibû çêkirin. Me ji aliyê Rojnameya Agirî ve bi hewce zanî ku li ser çawaniya xebat û berhemên wî hunermendê ciwan hevpeyvîneke pêre çê bikin.

**Hevpeyvîn: Dara Natiq**


Sefyedîn Cebarî

**Sefyedîn Cebarî kî ye?**

Fîlmçêkerê Kurd, Sefyedîn Cebarî di sala 1981’an de li gundê Gocar a ser bi bajarê Urmiyê hatiye dinê. Xwendina xwe ya destpêkî û heya wergirtina dîplomê di Urmiyê de bi dawî kir. Pisporî û pîşeya xwe ya fîlmçêkirinê di peymangeha Hunerên Ciwan de li bajarê Urmiyê wergirt. Navbirî heya niha 3 kurtefîlm bi navê “**Kabanî**”, “**Melakerem**” û “**Kamêra**” berhem anîne. Fîlma wî ya bi navê “Kamêra” karî xelata baştirîn kurtefîlmê di yekem festîvala Navneteweyî ya kurtefîlman de li Hewlêrê de bidest bixe.

**Kekê Sefyedîn çawan û kengê bû ku we dest bi hunera Sînemayê kir?**

Ez di zarokiya xwe de evîndarê hunera Sînemayê bûm, hunera Sînemayê hertim di hizr û xeyalên min de dilivlivîn. Her li ser vê bingehê min di sala 2001’an de bi awayekî fermî dest bi kar û xebata xwe di vî warî de kir û yekemîn berhema xwe bi navê “Kabanî” di sala 2002’an de tomar kir. Kurtefîlma min ya Kabanî derheq jiyan û bizav û hewlên jinên Kurd ên gundan e.

**Hûn hunera Sînemayê çawan pênasedikin û ji bo kesên ku dixwazin tevlî karê sînemayê bibin çi gotinek we heye?**

Ez hêj xwe di vê astê de nabînim ku qala Sînemayê bikim, lê ez tenê wê hindê dibêjim ku ew kesên ku dixwazin tevlî hunera Sînemayê bibin, divêt gelek mend û hêmin bin û herwisan rûvekirî bin û bo encama kar û berhemên baş divêt cehd û xebatekî zêdetir bikin.

**Hûn girîngiya rêveçûna yekemîn Festîvala Navneteweyî ya Kurtefîlman di Kurdistanê de çawa dinirxînin?**

Festîvala îsal li gorî salên berê gelek baş bû. Kurefîlmên baş bi teknîkên taybet beşdarî kiribûn, ya herî girîng û balkêş eva bû ku cuda ji fîlmên ku di Kurdistanê de hatibûn tomarkirin, ji welatên Norwej, Îran, Swêd û ... herwisan ji herçar parçên Kurdistanê kurtefîlmên baş pişikdarê festîvalê bûn.

**Taybetmendiyên vê festîvalê çi bûn?**

Bi baweriya min ya herî girîng eva bû ku bo cara yekemîn bû ku di Kurdistanê de Festîvaleke Navneteweyî ya kurtefîlman birêve diçe. Eva gaveke girîng û dîrokî ji bo sînemaya kurdî bû.

**Xelatên Festîvalê bi çi awayekî hatne parvekirin?**

Festîvalê bi giştî 3 fîlm weke fîlmên herî baş li Kurdistanê û 3 fîlm jî li derveyî Kurdistanê destnîşankirin, cuda ji wê çendê fîlmeke teybet ji Kurdistanê û yek jî li derveyî Kurdistanê weke yekemîn kurtefîlm destnîşan kir ku fîlma min a bi navê “Kamêra” yek ji wan 3 fîlmê herî baş bû ku hate xelat kirin.

**Dayîna vê xelatê ji bo kurtefîlma we çi bandorek li ser te hebû?**

Ez bi wergirtina vê xelatê gelek şad bûm, wergirtina wê xelatê bû sebebê vê çendê ku ez zêdetir bême haydan û xebat û tekoşîneke kûr û berfirehtir bikim di pêxema tomarkirina berhemên baştir.

**Hûn rewşa sînemaya Kurdî çawa dinirxînin?**

Mixabîn sînemaya Kurdî hêj negihîştiye asteke baş û evroyî, lê eva cihê keyfxweşiyê ye ku me fîlmçêkerên baş li herçar parçeyên Kurdistanê hene û fîlmên wan di astekî navneteweyî de tenê nîşandan û xelatên cîhanî werdigirin û herwisa karîne çand û hunera Kurdî li gorî îmkan û şiyana xwe bi cîhanê bidne naskirin. Ez bi giştî pêşeroja sînemaya Kurdî baş dibînim.

**Xebat û pirojeyên ve bo pêşerojê çine?**

Min du sinaryo li ber dest hene û ez hêvî dikim ku di sala 2007’an de wan bi dawî bînim.

**Gelek sipas ku we dema xwe bi me re veqetand.**

**Sipas ji we û xwendevanên we yên hêja.**

---

**Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:**

**1. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.**
**2. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.**
**3. Hejmarên 1-9’ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.**

## Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 1 | | 4 | 2 | 5 | 9 | | |
| 3 | 8 | | 1 | 7 | 6 | 2 | | 5 |
| | | 2 | 8 | | | 6 | | 7 |
| 7 | 6 | 8 | | 4 | 3 | | | |
| 5 | 2 | | 6 | 9 | 8 | | 7 | 4 |
| 9 | 3 | | 2 | 1 | 7 | 5 | | |
| 1 | 4 | 6 | | | 2 | | | |
| | | | | 6 | | | | |
| | 7 | 3 | | 8 | | | | 6 |

## Bersiva Sudoku a Hejmara 54’an

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 4 | 1 | 2 | 8 | 5 | 3 | 6 | 7 |
| 3 | 2 | 7 | 9 | 1 | 6 | 4 | 8 | 5 |
| 5 | 8 | 6 | 4 | 3 | 7 | 1 | 2 | 9 |
| 1 | 7 | 3 | 5 | 2 | 8 | 6 | 9 | 4 |
| 8 | 9 | 4 | 7 | 6 | 1 | 5 | 3 | 2 |
| 6 | 5 | 2 | 3 | 9 | 4 | 7 | 1 | 8 |
| 2 | 3 | 5 | 6 | 7 | 9 | 8 | 4 | 1 |
| 7 | 6 | 8 | 1 | 4 | 2 | 9 | 5 | 3 |
| 4 | 1 | 9 | 8 | 5 | 3 | 2 | 7 | 6 |

www.arsivakurdi.org

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**




# Gefên Turkan Li Ser Kurdistanê Her Berdewam Dikin



Midehek e ku gefên Turkan li ser Kurdistana Başûr û Kerkûkê û herwiha li ser bezandina sînorên Kurdistanê bi merema şopandina şoreşvanên Kurd berdewam dikin. Li vê derheqê de Serok Wezîrê Turkiy, Receb Teyib Erdoxan da zanîn ku: "Ger Kurd Kerkûkê konterol bikin, Turkiye bêdeng namîne. Erdoxan eşkere kir ku cehd û tekoşînek bo guherîna esnografiya bajarê kerkûkê heye ku em jî nikarin li hember de bêdeng bimînin". Lê eşkere nekir ku dê çawa û bi çi awayekê rê ji vê xebatê bigire.

Erdoxan herweha tekez li ser wê kir ku Turkiyê mafê wê heye ku bo şopandina kesên ku ew bi "şoreşiyên kurd" dinase, biçe nava xaka Îraqê. Wî zêde kir ku Turkiye dê li dema xwe de kiryarên hewce bo xebata li dijî wan kesên ku wî bi terorîst dan zanîn, bi encam bigehîne.

Erdoxan li doma axavtina xwe de zêde kir ku Amerîka dê tûşî şaşiyê bibe ger ku ji dewleta Turkiyê ku têkiliyeke dîrokî û çandî bi welatên deverê re heye, bixwaze ku destêwerdanê di kar û barên Îraqê de neke. Herweha got ku me 350 KM sînorê hevpar bi Îraqê re heye û mere dibêjin ku destêwerdanê di Îraqê de nekin, lê çima Amerîka ku 10000 kîlometran ji Îraqê dûr e hatiye maytêkirinê di kar û barên Îraqê de dike.

Turkiye li ser vê bawerê ye ku 5000 çekdarên kurd ku ji bo Otonomiyê di Turkiyê de xebatê dikin, di Kurdistana Îraqê de çeper girtine. Herweha Turkiye bi tundî dijberiya ramana serxwebûn xweziyê di Kurdistana Başûr de dike, ji ber ku nîgeranê wê ye ku tesîrê ji Kurdên Turkiyê bike.

**Serokatiya Herêma Kurdistanê:**

## zimanê gefxwerinê pare nake




Her di çarçoveya wan gefên Turkiyê de, berdevkekê bi navê Serokatiya Herêma Kurdistanê ragihand ku heyamek e ku berpirsiyarên Turkiyê dest avêtine axaftinên bêmana û bi zimanê gefan ve dipeyivin. Em tenê vê yekê ji wan re dibêjin ku ji bîra we neçe ku Împeratoriya Osmanî mêjdem e ku hatiye hiloşîn û Îraq ne parek ji Turkiyê ye. Îraq welatek serbixwe ye û gelên Îraqê dê bi xwe çareseriya pirsên xwe bikin.

Berdevkê Serokatiya Herêma Kurdistanê li doma axaftina xwe de got: Ger ku hûn mafê destêwerdana di kar û barên welatan de bi xwe didin, divêt çavnihêriya maytêkirina xelkê din di welatê xwe de jî bikin. Herweha da zanîn ku li cihê gefxwerinê, werin em destê hevkariyê bo aliyê hev dirêj bikin, çunku cîhan guheriye û dema zimanê gefan biser çûye.

# Pîsbûna Jîngehê Li Tehranê Di Mehekê De Jiyana 3600 Kesan Stand



Bi sedema pîsbûna jîngehê li heyamê mehekê de, 3600 kesan li Tehranê de jiyana xwe ji dest dane. Bi vî awayî Tehran bi yek ji wan bajaran tê hejmartin ku xwediyê jîngeheke gelek pîs e.

Di vê derheqê de çavkanî li zarê Mihemed Hadî Heyderzade berpirsyarê jîngehê li şaredariya Tehranê ve eşkere dikin ku ji 23 Oktobrê bo 22'ê Novemberê bi awayekê rasterast yan nerasterast 3600 kesan bi sedema pîsbûna jîngehê jiyana xwe ji dest dane, wate di rojê de 120 kes bi vê sedemê bûne gorî.

Navhatî herwiha zêde kiribû ku haletên mirinê bi sedema nesaxî û giriftên Dil bûne û eva jî kirîzeka cihê metirsiyê ye û dikare bi xwekujiyeke bikom bihê hesibandin.

Hêjayî gotinê ye ku jingeha Tehranê ji ber zêdebûna trombêlan bi terzeke metirsîdar pîs bûye, bi awayekê ku nîviya trombêlên wî bajarî ku nêzîk bi 6 milyon dezgehan dibe, guh bi rênimayiyên parastina jîngehê nadin.

**"PUK media"**

# Metirsiya Tûşbûna Bi Îdzê Gefê Ji 3 Milyon Moitadên Îranê Dike



Li gor gotina Dr. Kamiyar Elayî, Serokê "Ensîto Pars" di Îranê de pêtir ji 3 milyon moitadên bi madeyên bêhişker li Îranê de hene ku yan tûşî nesaxiya Îdzê bûne yan jî ger tûş nebibin, metirsiya tûşbûnê gefê ji canê wan dike.




Wî da zanîn ku niha pareke zaf ji nifûsa tûşbûyî bi "HIV"ê di Îranê de li jinan pêk tê, ku ew jî bi egera berçavî û sedemên çandî û civakî nikarin ji alîkariyên hewce bo destnîşankirin û çareseriya vê nesaxiyê mifahê bistînin.

Herweha got ku di welatên Rojhilata Navîn û Asyaya Navîn de piraniya tûşbûyên bi vê rebtdayîn nesaxiyê bi encamdana kiryarên zayendî tên û zêde kir: Ez bawer im ku pirsgirêkên çandî, mezintirên astenga li ser rêya alîkarîkirin bi tûşbûyên vê nesaxiyê ye.

Dr. Elayî li vê derheqê de da zanîn ku di çanda me de li gor nebûna zaniyarî û şarezayiyên derheq vê nexweşiyê xelkê re tomet û buxtan tên ledayîn û eva jî dibe hegera wê ku kesê/a tûşbûyî xwe ji wergirtina hevkariyên hewce bo pêşgîriyê biparêze û di encam de jî nesaxî bandora xwe bike û tûşî kesên din jî bibe.

www.arsivakurdi.org